Hunermendê civakê ye. Karîbû bi awazine nerm û dilkêş dilê her ciwanekî bigire û bala her mirovekî ber bi hunera xwe ve bikişîne.
Hunermend Faris Bavê Fîras di sala 1954’an de li gundê Tenûriyê yê rojhilata bajarê Qamişloyê ji dayîk bûye.
Çawa ku temenê wî dibe 10 sal, dest bi sitranbêjî û sazbendiyê dike. Di 12 saliya xwe de hewildanên wî yên nivîsîna helbestê hebûn.
H.Faris Bavê Fîras, cara pêşîn gotin û awazên xwe sitrane; sitranên wî yên pêşîn: “Dostê Xelkê bi Sedan Bûn” û “Koça Bar Kir” bûn. Lê belê paşê gotinên helbestvanên mezin ên mîna: Seydayê Cegerxwîn, Seydayê Tîrêj, Melê Darî û Mihemed Eliyê Hiso bi awaz kirine û sitrane. Hetanî aniha 36 albom berhem dane û 15 albomên wî yên taybet jî ku di şahîyan de dagirtine, hene.
Ji hunermendên ereban kêfa wî ji H. Fu’ad Salim û Selah Ebdulxefûr re tê û ji kurdan jî kêfa wî ji H. Se’îd Yûsiv, Rif’et Darî û Mihemed Şêxo re tê.
Piştî ku bi dirêjahiya 40 salan jiyana xwe kêlî bi kêlî li gundê Girbawî derbas kir, koçberî bajarê Zaxoyê bû. Ew aniha hewil dide ku careke din vegere û li gundê xwe bi cih bibe. Di vê hevpeyvînê de, H. Faris Bavê Fîras li ser qonaxên jiyan û hunera xwe diaxive û der barê çend babetên cihê de nihêrînên xwe vedibêje.

Hevpeyvîn: Ferîd Mîtan

- Berî ku tu bi awayekî fermî rêya hunerê bişopînî, te çawa behreya hunerî li bal xwe vedît û çawa te karîbû ewê behreyê geş bikî?

Hêj ez zarok bûm kêfa min ji wêjeyê re dihat. Dema ez di refa şeşê de bûm, min dîwanên Seydayê Cegerxwîn, Seydayê Tîrêj, Mele Ehmedê Palo û yên gelek helbestvanên din dixwendin, bi vê xwendinê re behreya min geştir dibû û her ku dem dibihurî ez ber bi hunerê ve diçûm. Min ew helbest dixwendin û bi rastî min dixwest bibim helbestvan, ji lew re min helbest bi erebî û kurdî dinivîsîn. Di wê demê de min ji xwe re digot gerek e hunermendên me sitranên ji wisa xweştir bibêjin, min digot ne tiştên di dilê min de ne jî yên di dilê hevalên min de di van sitranan de peyda nabin! Bi vî çavî û bi vê daxwazê ez nêzîkî hunerê bûm û min dest bi sitranbêjiyê kir. Îcar gelek çîrok û serpêhatiyên dost û hevalên min hebûn, min ew çîrok û êşên wan dikirin sitran û digotin. Ev jî bû sedema wê yekê ku kêfa xelkê ji hunera min re were.

Min ew sitran ji evîndara xwe re got.

- Cara herî pêşîn te ji kê re sitra?

Di sala 1981’ê de min sitrana xwe ya pêşîn a bi navê “Koça Bar Kir” tomar kir. Min ew sitran ji evîndara xwe re got.

- Di sitranên te de banglêkirin, kesayet, pesin û ristine ku kêlîne bibandor vedibêjin hene. Gelo her sitranek çîrok û serpêhatiyeke girêdayî rastiyê tê de heye, yan jî tenê ji nîgaş û afrîneriya te ye?

Ji her du cureyan hene, lê para herî mezin li ser xelkê ne û çîrokên wan rast in. Sitrana “Nezha” yek ji wan sitranan e ku çîroka wê rast e.

Min hin gotin di sitranên xwe de bi kar anîn, paşê ez poşman bûm ku min ew gotine.

- Bikaranîna zimanê erotîzmê di hunera te de baş tê dîtin. Guhdarê kurd çawa ji vê babetê (erotîzm) nêzîk dibe û dema te ev şêwaz di sitranên xwe de bi cih dikir, gelo carinan tu dudilî dibûyî yan na?

Rast e, ev reng di sitranên min de heye. Min hin gotin di sitranên xwe de bi kar anîn, paşê ez poşman bûm ku min ew gotine. Her çi qas gelek helbestvanan ev

gotinên erotîzm nivîsîne jî, lê nizanim, ez li hinan poşman bûme ku min tevlî sitranên xwe kirine. Kesên ku li min jî guhdar dikirin, kêfa hinan dihat, hinan jî digot xwezî te ev gotin tevlî nekirana.

- Her hunermendek sitraneke wî heye ku jê re bûye nasname û sedema navdarbûnê. Îcar ji bo te, sitrana ku herî zêde nav û dengê te belav kir, kîjan bû?

Ê min du sitran bûn sedemên navdarbûna min: Koça Bar Kir û Dostê Xelkê bi Seda Bûn.

- Ji tevahiya sitranên te, herî zêde guhdarkirina li kîjan sitranê li xweşiya te diçe û bandorê li te dike?

“Heta kengê li hêviya te bim, por sipî bû hê ez can im.”

- Te bi xwe gelek sitran berhem dane û gelek kaset dagirtine. Berhemdana hejmareke mezin ji sitranan, ji milê hunerî ve zerer li te nekir?

Belê, gelekî! Min salê sê kaset dadigirtin. Eger tu ya rast jî bixwazî, wê demê bêhtirî xwe bazirganî bû, me kaset dadigirtin û difirotin. Me gelekî guh nedida helbest û awazên xweş, hema me digot bila were firotin.

- Bibûre mamoste, carê çîrokeke xweş li ser te dihat gotin: Mirovek çû tomargeheke kasetan, îcar kaseteke Faris Bavê Fîras ji xwediyê tomargehê xwest. Xwediyê tomargehê jê pirsî: “Te kaseta sibehê divê, ya esrê yan jî ya êvarê?” Ji bo vê çîrokê çi dibêjî?

Belê ev rast e. Selah Resûl ev gotin belav kir. Tomargeheke wî hebû, xelkê kasetên min jê dixwestin û wî jî ev pirs ji wan dikir.

- Di sitranekê de herî zêde kîjan girîng e: gotin, deng an jî awaz?

Herî pêşîn deng e. Deng mirovan dike hunermend, gava tu dibêjî ev kes hunermend e, ango mirovekî dengxweş e. Ya duyan divê gotin xweş bin û ya sêyan jî awaz in. Gava her sê xweş bin û li hev biguncin, ew sitran namire.

- Ji hunermendên kurd kê bandor li te kiriye, yan jî di destpêka xwe de herî zêde te li kê guhdar dikir?

Ne babeta bandorê, lê di destpêkê de min baş li hunermend Se’îd Yûsiv guhdar dikir. Gotin û awazên wî xweş in.

- Ji hunermendên roja îroyîn, tu li kê guhdar dikî?

Ez li hunermendên kurd guhdar nakim. Asta hunermendên kurd ne digihe asta yên ereban ne jî digihe asta yên tirkan. Dengên xweş li nav kurdan hene, lê şêwaz û awaz ne xweş in. Ji hunermendên berê: Se’îd Yûsiv, Mihemed Şêxo, Mehmûd Ezîz û Se’îd Gabarî jîr bûn. Dema ez dibêjim hunera kurdî negihaye asta ya erebî û tirkî, herî pêşîn ez li ser xwe dibêjim.

Di nava kurdan de Ûsivê Çelebê yê yekê ye, “reqem yek e”.

- Di dema we de guhertinên berbiçav di warê hunerê de çêbûn, deng û rengên nû peyda bûn. Tu çawa dikarî li ser wê pêvajoyê biaxivî?

Destpêkê tembûra çardehperde bû, Ûsivê Çelebî hostayê wê bû. Gerek e Ûsivê Çelebî di dîroka kurdan de her û her zindî bimîne, mirovekî pir şareza bû. Rast e nexwenda bû -nedixwend û nedinivîsî- lê hejmareke mezin ji sitranan got û tenê yeke nexweş jî nesitra. Di nava kurdan de Ûsivê Çelebê yê yekê ye, “reqem yek e”. Paşê Se’îd Yûsiv amûra biziqê bi kar anî, wî jî hunereke bilind pêşkêş kir.

- Te helbestên kê û kê bi awaz kirine û sitrane?

Awaz hemî yên min in, lê helbest ên Seydayê Cegerxwîn, Seydayê Tîrêj, Melê Darî, Mihemed Eliyê Hiso, parêzer Xelîl û çendên din in.

Ez dibêjim 500 sitranên min hene.

- Bi hejmar, te çend sitran tomar kirine?

Bi hejmar ez nizanim, lê 50 kasetên min hene, di hin kasetan de 8 sitran û di hinan de 12 sitran hene. Ez dibêjim 500 sitranên min hene.

- Di roja îroyîn de tu çawa rewşa hunerî li Rojavayê Kurdistanê dinirxînî?

Aniha baş e, hunera Rojava li pêş ketiye. Kêfa min bi xwe ji Şeyda û Sefqan re tê, dengê wan xweş e û awazên wan jî.

- Ji bo demên bê, çi projeyên te hene?

Ev sê sal in ez hinekî bi dûr ketime; gelek merivên me hem li Rojava hem li Herêma Kurdistanê şehîd bûn, ji vê yekê dilê min pê ne xweş bû ku sitranan bibêjim.

- Gelek qewam û bûyer li Rojavayê Kurdistanê rû dan. Te tiştek ji Rojava re nesitra?

Min sitranek li ser Qamişloyê got. Min digot ez ê li ser Efrînê û hin deverên din jî sitranan çêkim, lê ez nexweş ketim, ev heye sê sal ez nexweş im.

- Li Rojavayê Kurdistanê gelek guhertinên berbiçav çêdibin û gelek pirsên bêbersiv jî hene. Bi dîtina te, em ber bi kû ve diçin û ji bo demên bê çi pêşbîniyên te hene?

Dema ez biaxivim, divê ez têkevim çarçoveyeke siyasî û li vê derê jî siyaset “ne merxûb e”. Gelek tişt di dilê min de hene, lê nikarim bibêjim. Eger ez bibêjim, dengê min dê dûr biçe. Ez ne geşbîn im, reşbîn im. Hetanî ku zilhêzên cîhanê tiştekî berbiçav û xuya pêşkêşî me nekin, geşbînî bi

min re çênabe. Pirsgirêka herî mezin ew e ku em ne yek in, ji ber vê yekê jî tu kes piştgîriya me nake. Em koleyên xelkê ne û dijminên hev in. Hêviya me bi rewşenbîrên welatparêz gelekî mezin e, lê rewşenbîrê newelatparêz metirsî û xetera wî gelekî mezin e.

Bi yek gotinê:

- Gotina herî xweş ji bo te çi ye?

Azadî di ser her tiştî re ye. Eger welat jî hebe lê azadî tune be, dîsa vala ye.

- A herî ne xweş?

Bindestî.

- Kêliya ku tu carî ji bîr nakî?

Tişta ku hetanî sax im ji bîra min naçe: Mirovê ku min ew wekî birayekî ji xwe re didît, tam berovajî nerîna min derket.

- Eger di dinyayê de her tişt bi destên te ve werin, tu yê çi bikî?

Xwedê wekal e hin mirov hene, kuştina wan helal e.

- Dixwazî bi rêya hunera xwe çi peyamê bigihînî?

Dixwazim bi hunera xwe wê peyamê bigihînim ku heçî hunermend e divê ku rewşenbîr be û rêyeke zanistî bişopîne.

- Di jiyana xwe de tu li çi poşman bûyî?

Keçek hebû kêfa min jê re dihat, ji dest min dihat lê min ew nexwest, paşê ji dest min çû...

- Tu yê rojekê ji rojan geşta xwe ya hunerî bidî rawestandin an na?

Erê. Hetanî aniha hêj jî dikarim, lê dema min dît ku nema dikarim, ez ê rawestim. Ez ê binivîsim û awazan jî deynim, lê weku deng belku rojekê ji rojan rawestim.

- Tu yê careke din venegerî gundê xwe?

Belê, ez ê vegerim.

- Gotina dawî.

Gotina min a dawî ew e ku miletê kurd guh bide helbestvan, hunermend û lêkolînerên xwe. Bi hêvî me ku dezgehên ragihandinê jî li mirovên xwe bi xwedî derkevin.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Serpêhatî

Kurê Wî Lê Gihaye

Dildarê Mîdî

Hatiye gotin ku mirovekî gundî, hejar û belengaz, her roj radihişt dasik û werîsê xwe, li kerê xwe siwar dibû û berê xwe dida dehlê; li navsera çiyê ji xwe re dar dibirîn, darên birî dibirin bajêr difrotin û bi pereyên daran ji zarokên xwe re cil, firax û kel û pelên malê dikirîn.

Piştî ku demek derbas bû, rojekê ji rojan dît ku pişta kerê wî kul bûye û bûye birîn. Dilê wî bi kerî şewitî, rabû ji xwe re got :"Bi Xwedê ker guneh e… de hema ez van her çend rojan tu karî bi kerê xwe nakim; ez ê bi tena xwe herim û tişta ji min were, li gor qeweta xwe ez ê hilgirim, baştir e ez vî tebayê birîndar binbar bikim û Xwedê li min bigire, bila ew jî çend rojekî vehise û xwe rehet bike, ta ku piçekî birîna wî bi ser hev de were ".

Rabû weke her car, rahişte dasik û werîsê xwe, lê vê carê bi tena xwe berî da navsera çiyê, nav daristanê. Dest bi birîna daran kir û li gor karîna xwe kom kirin. Barê xwe girê da û li ser pişta xwe kir, bir bajêr firot û vegeriya malê. Lê her ku derbasî hewşê dibû û kerê wî çav pê diket, dizirî. Ewî nas dikir ku kerê wî birçî maye lewra dema çav li xwediyê xwe dike dizire. Xwedî jî nemerdî nedikir, di cî ew bi êm û av dikir.

Çend rojekî bi vî halî qedand, lê ji tab û westana bar û çûn û hatinê ji hev ket, gelek renc û eziyet bûrand.

Rojekê weke her car, dema ji kar vegeriya û derbasî hewşê bû, kerê wî çav lê kir, dîsa bû zire zira wî û zirî. Yê gundî hingî westiyabû ji hev ketibû, hema ji qehra hinavê xwe li kerî nihêrî û got: "Ma çima nazirêêê!! Ew dizane ku kurê wî li wî gihaye.."

Gotarên ku tên weşandin, nerînên xudanên xwe ne.

Di Duyemîn Pêşangeha Pirtûkan a Rojava de... "Surprîzên Xweş Hene"

Bûyerpress - Taybet

Di 20'ê tîrmeha 2018'ê de "Duyemîn Pêşangeha Pirtûkan a Rojava" ku bi serpereştiya Desteya Çand û Hunerê li Herêma Cizîrê ye, "bi tevlîbûna 30 maseyên pirtûkan" li bajarê Qamişloyê vedibe û hetanî 25'ê mehê didome. Hevseroka Desteya Çand û Hunerê li Herêma Cizîrê B. Bêrîvan Xalid di daxuyaniyeke taybet de ji Bûyerpressê re got: "Di her şeş rojên pêşangehê de ku tê de hejmareke mezin ji rêxistin û hevgirtinên rewşenbîran li hev kom dibin, me hewil daye ku em dema xwe baş qezenc bikin û birek ji çalakiyên xwerû çandî di pêşangehê de li dar bixin."

Sala çûyî pêşangeha pirtûkên bi gelek çalakiyên çandî û wêjeyî

dagirtî bû, der barê çalakiyên îsal de jî B. Bêrîvan Xalid da zanîn ku "surprîzên xweş hene".

Der barê rêxistin û aliyên ku dê di pêşangehê de beşdar bibin, Hevseroka Desteya Çand û Hunerê da zanîn "dê weşanxaneyên Bakur û Başûrê Kurdistanê û yên hundirê Sûriyeyê, hevgirtin û kombûnên rewşenbîran, kesayetên serbixwe û pirtûkxaneyên deverê jî tevlî pêşangehê bibin."

Di "Yekemîn Pêşangeha Pirtûkan a Rojava" de ku sala 2017'ê hat lidarxistin, mêvanê pêşangehê romannivîsê Lubnanî Ebas Huseynî bû ku di çarçoveya çalakiyên pêşangehê de romana wî ya bi navê "Evîndar" hat îmzekirin. Xalid ragihand ku eger tu pirsgirêk li ser sînor dernekevin "du nivîskar dê ji derveyî Rojava jî beşdar bibin, Hevseroka Desteya Çand û Hunerê da zanîn "dê weşanxaneyên Bakur û Başûrê Kurdistanê û yên hundirê Sûriyeyê, hevgirtin û kombûnên rewşenbîran, kesayetên serbixwe û pirtûkxaneyên deverê jî tevlî pêşangehê bibin."

Di "Yekemîn Pêşangeha Pirtûkan a Rojava" de ku sala 2017'ê hat lidarxistin, mêvanê pêşangehê romannivîsê Lubnanî Ebas Huseynî bû ku di çarçoveya çalakiyên pêşangehê de romana wî ya bi navê "Evîndar" hat îmzekirin. Xalid ragihand ku eger tu pirsgirêk li ser sînor dernekevin "du nivîskar dê ji derveyî Rojava jî beşdar bibin, Hevseroka Desteya Çand û Hunerê da zanîn "dê weşanxaneyên Bakur û Başûrê Kurdistanê û yên hundirê Sûriyeyê, hevgirtin û kombûnên rewşenbîran, kesayetên serbixwe û pirtûkxaneyên deverê jî tevlî pêşangehê bibin."

Di axaftina xwe de Hevseroka Desteya Çand û Hunerê B. Bêrîvan Xalid ragihand ku Desteyê bi xwe jî 15 pirtûk çap kirine û dê di pêşangehê de belav bike, her wiha bal kişand ser wê yekê ku ev her her 15 pirtûk girêdayî dîrokê ne û roman in.

Hêja ye mirov bibêje ku di vê pêşangehê de dê maseyeke girover ji bo nîqaş û hevpeyvînê hebe û di piraniya rojên pêşangehê de dê semîner hebin û tenê rojek dê ji bo îmzekirina pirtûkan hebe.

Daweta Kundan

Dilovan Çeto

Mîr bang li wezîrê xwe kir û wiha pirsî:

- Di vî welatî de çi heye çi nîne, gelo miletê min ji min razî ye, li ser min çi dibêje? Lê berî tu bersivê bidî, ez dizanim tu yê çi bibêjî. Min tu carî nebihîstiye ku rojekê ji rojan kesekî nerazîbûna xwe daye xuyakirin û ez bawer im tu kes birçî namîne, ji ber ku ez dizanim çi qasî xêr heye, mîna xêr û xweşiya di qesra min de.

Pepûkê wezîr dixwest rastiya ku bi çavên xwe dibîne ji mîr re bibêje, lê…

Mirovek di bajêr de hebû pir zengîn û maldar bû, bazirganekî pir mezin bû. Rojekê ewî bazirganî xwarina mîr û zilamên wî çêkir. Mîr çend siwar û zilamên xwe dan pey xwe û berê xwe da mala bazirgan. Bi rê de gihane gundekî xerabe, rêya wan di nava gund re derbas dibû.

Li milê rastê refekî kundan li ser xaniyekî xerabe danîbû, li milê çepê jî refekî din hebû. Mîr û kesên pê re gihiştin hemberî kundan, dengê kundên milê rastê hate wan, zilamekî ji zilamên mîr bang kir:

- Ji kerema xwe re hinekî rawestin... ez ji van kundan fêm dikim û bi zimanê wan dizanim!

Dema ku mîr ev gotin bihîst, destê xwe hilda û got:

- Rawestin!

Piştî ku kundên milê rastê gotinên xwe bi dawî kirin, mîr ji wî zilamê xwe pirsî:

- Van kundan çi got?

Zilam got:

- Mîrê min, xuya ye ev kundên milê rastê hatine ser cilika kundên milê çepê; xwazgînî ne, dê yekê bixwazin.

- Ma kundên milê çepê çi dibêjin? Mîr pirsî.

Bû qide qida refê çepê, zilam got:

- Ew dibêjin:

"Hûn li ser çavan hatin."

Refê milê rastê got:

"Ji kerema xwe re, ka ji me re bibêjin nexta (qelen) bûka me çi ye (çi qas e)?"

Refê aliyên bûkê got:

"Nextê wê çil gundên xerabe ye!"

Mîr bi lez got:

- Guhê xwe bide wan; ka ew ê çi bibêjin.

Zilam domand:

- Kundên rexê zavê got:

"Me qebûl kir!"

Lê malbata bûkê dibêje:

"Hûn ê çawa karibin çil gundên xerabe peyda bikin?"

Yekî ji refê zavê bang kir û got:

"Saya Xwedê û serê mîr, eger we çil xwestiye, em dikarin zêdetir ji pêncî gundên xerabe qelenê bûka xwe bidin."

Mîr matmayî ma û got:

- Gelo mebesta van kundan kî ye?

Zilam got:

- Mîrê min, ev gotin hemî li ser te ne!

Dema ku mîr li vê diyaloga di navbera her du refên kundan de guhdar kir, bi tepan bi serê xwe ket û got:

- Hetanî bi kundan jî dizanin ku ez xerabiyê di vî welatî de dikim… wey xwelî li serê min be, min digot qey ev welat razayî ye û tu kes devê xwe venake, çimkî rewşa wan xweş e loma tu problem di welatê min de dernakeve, lê min nizanîbû ku ji tirsan re tu kes newêre devê xwe veke!

Bêhnekê bê deng ma… paşê serê xwe rakir û got:

- Gelî ciwanmêran! Miletê min ê hêja: Ez soz didim bi Xwedanê mezin ku ji îro pê ve ez zilm û zor û sitemê li tu kesî nema bikim; ez ê hewl bidim gund û deverên xerabe ava bikim. Ez ji we dixwazim ku hûn jî alîkariya min bikin û eger ez xwar çûm şîretan li min bikin, da ku di welatê me de sitem nemîne.

RÊZIMAN

Venerîneke Dîrokî Li Rewşa Zimanê Kurdî 3

Deham Ebdulfetah

Bi dîtina piraniya karnasên zimanên dêrîn, Avista bi zimanê Zeradeşt ê dayîkê, zimanê welatê ku lê bûye û lê mezin bûye hatiye nivîsîn.

Bobelata herî kambax ku bi ser Avista de hatiye ew zêdegaviya hovane bû, dema ku Îskenderê Makdonî sala 331'ê BZ pirtûkxaneya şahinşahî, li bajarê Istexirê[1] (paytexta ola Zeradeştî) şewitand. Piraniya bergên wê pirtûka pîroz şewitîn, tenê nêzî 83000 bêje ji wê şewatê rizgar bûne. Lê ya xoşbextane ew bû ku hemû deqqên (metnên) wê pirtûkê di sîngên Mûbîdanan[2] de parastî bûn. Bi vê yekê jî tiştek ji Avista winda nebûbû.

Sala 147'ê BZ, cara pêşîn bû ku Avista (piştî wê şewatê) hatibû nivîsîn û cara duwem jî sala 226'ê zayînê hatibû nivîsîn.

Ew zimanê ku Avista pê hatiye nivîsîn çi be û çilo be jî ne xem e, herî ew ziman bi navê zimanê Avistayî hatiye nasîn. Zimanê Avistayî jî, bi sedema ku zimanê ola Zeradeştî bû desthilatiya xwe li ser qada zimanê Parsî[3] (Exmînî) û zimanên hawirdor jî kiriye. Gelek bandor û kartêkirin di navbera zimanê Avistayî û zimanên dîtir de bûye. Zimanê Kurdî jî yek ji wan zimanên ku bandora Avistayî lê xuya dibe. Ev jî bûye cihê rawestan û jixwepirsînê!

Di Avistayî de pêşgira "e" alava neyînê ye, beranberî alava "ne"ya Kurdî, bi kar tê.

Di Avistayî de gotina "emir" bi kar tê, beranberî wê di Kurdî de "nemir" bi kar tê.

Di Avistayî de paşgira "tat" digihêje navên şênber (madî) û wan dike navine razber (manewî).

Beranberî vê paşgirê di Kurdî de paşgirên "îtî, ayetî, tî" bi kar tên, wek :

- Di Avistayî de (e + mir + tat) = emirtat
- Di Kurdî de (ne + mir + îtî) = nemirîtî

Wisan jî "heval + tî = hevaltî", "Kurd + ayetî = Kurdayetî"

Ji bilî vê jî hin gotinên Avistayî di zimanê Kurdî de tên dîtin (di gel hin guherînan)[4] :

Evistayî	Kurdî
Zamatir	zava , zawa
Zereya	zerya ,oqyanos
Asu	asik , xezal
Mese	masî
Vizim	xizim , meriv
Per-to	têper (derbasbûn)
Zime	zistan , zivistan
Zantî	zanîn
Pesu	pez
Az	ez

Bi vê ronîkirinê têkiliya zimanê Kurdî û yê Avistayî bi hev re ron û diyar dibe, ku ew têkilî sînorên bandor û kartêkirinan derbas dike.

1 - Bajarekî kevin e, li ser kavilên bajarê "Parsî Polîs" hatiye avakirin. Demeke dirêj weku paytexta ola Zeradeştî maye .

2 -Mûbîdan : Pîrên ola Zeradeştî

3 - Zimanê Parsî : Zimanê Xurasaniya kevin e .

4 - 26 , 25 , 24, 23 ص 1987- مسعود محمد لسان الكرد بغداد Mes'ûd Mihemed : Zimanê Kurdî. Bexda (1987)- R. (23-24-25-26)

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Helbestine Bijartî... Ferîdê Cizîrî

Bûka Welat

Keça Kurdistan, îro dibistan
Bêdeng e kerr e, mîna goristan
Mamosteya rind, rewşa şar û gund
Sekîne nehat, xûşka serbilind
Mezin û biçûk, bûne pilûlûk
Kanî Sekîne, gelo bûye bûk
Dêrsim keça te, şêra xebat e
Serê te hilda, bûka welat e
Li Mûş û Mêrdîn, Qoser, Nisêbîn
Li Wan û Amed, dida tekoşîn
Dibû şoreşgêr, rahişt tevir û bêr
Ger şêr e, şêr e, çi jin û çi mêr
Çêlya pilingê, rahişt tivingê
Himêz kir welat keça zivigê
Dijminê xûnrêj, demek pir dirêj
Xiste zindanê, xûşka Gelawêj
Tirsokê kedxwer, dest datanî ser
Canê pak kutan, her ro ketûber
Xebata jinê, xiste rû dinê
Em ji bîr nakin, heya mirinê
Paşê bû şehîd, hevala Egîd
Serê xwe danî, cem yê Şêx Seîd
Xûşka te Fatê, dakat xebatê
Tola te hilda, nêva civatê
Nemir Sakîne, namre Sekîne
Pêta xebatê, her dem dimîne

Bo Me Divêt Berxwedan

Bo me divêt berxwedan
Gorî te bin dil û can
Welatê me wek buhişt
Werdigerin zik û pişt
Neyar welatê me dot
Vala ye tim gotegot
Welatê min rez û dar
Şînok û sêv û hinar
Deştên me mêrg û kanî
Xirxop in gund û xanî
Tê hene gur û rovî
Tê pir in şêx û sofî
Gemî li Cûdî rawest
Gel tev de bûne serbest
Cotar û palên welat
Mizgîn e roja me hat
Bo me divêt berxwedan
Gorî te bin dil û can
Da ko bijî Kurdistan
Yan Kurdistan yan neman
Dijminan tişt tê nehişt
Nokeran xwîna me mijt
Serjê dike gayê cot
Neyar hestiyê min kevot
Cihê gezo avê sar
Rengê fêkî bê jimar
Havîngehin li banî
Neyar maye kevanî
Zozan tijî ne kovî
Dame nasîn bi hovî
Kurdan li wir jîn dixwest
Çima em mane bindest?
Mil dane hev bo xebat
Nêzîk e roja felat
Da ku bijî Kurdistan
Yan Kurdisrtan yan neman

Mêrê Bêkêr Piştî Şer Hêrs Dibe

Nabin xulamê axa, me navên ew kesên çewt
Serşor û pişt bi ax in, dîsan dikin lewte lewt
Xwîn û keda me xwarin, hê jî dikin hewte hewt
Em in pêxwas û birçî, para me ne şiv û rewt
Gundên me bûne kavil, pişka me koçber û şewt
Nan medne tûlê wilo, xelkê re kir ewte ewt
Piştî ku gur pez revand, nivre dike kewte kewt
Pêşeng e êdî karker, li wan gerand "simi 'lmewt"
Biste bînin ser ziman pê bistirên bikin newt

Ez û Hêsir

Rondika tîna şewatê
Zor e şewta bobelatê
Ew dilopa tê dibare
Şîreya cergê hejar e
Hêsiran ko vedirijînim
Rondikan ko vedigerînim
Arezû pê kill dibe
Tev minêka dil dibe
Vîn xwedî biryar dimîne
Hiş eger xunkar nemîne
Da ji agir maç bidin
Can di rê de bac didin
Gend û zingarên me narin
Pend û raman zare zar in
Şîreya cergê bi jan e
Kî bivê janê dizane?
Ger kelê hêsa dike
Ew nehîlet şa dike
Qasekê dil kerr dibe
Dil bi xwînê der dibe
Çendî ko dox lê gêre be
Ma, hiş terazû pê re be
Raserî hest û dil e
Can bi êşan têkil e
Perwane tên dora çira
Çawa ye vîna dilgira?
Agirê Zerdeşt nebe
Ta ko Laleş bende be

Dayê

Dilovanê dayê, bi kovanê dayê, şêrînê lê dayê
Peyên tola te xweşmêr in, mebê kî ne
Hevalê can bi can, ew tev de hêvî ne
Jiyana bêmirin, pîroz e şêrîn e
Xelata pekrewanan, bo te mizgîn e
Were dayê bi sê dengan, bilîlîne
Were xemla min î bûkaniyê bîne
Were dayê der û hundur, bixemlîne
Çi qa derdê giran, cergê te dêşîne
Bi moralên bilind dujmin, tu dişikîne
Erê hêrsa te pir, dujmin ditirsîne
Dibe dîrok û dayîk pê di lorîne
Dayê… dayê... neyar nedhate rayê
Dayê… dayê ... kes li hana me nayê
Dayê... dayê... gula baxê cihanê
Dayê… dayê... kovana pîrê Xanê
Dayê… dayê... divabû bême hanê
Dayê… dayê... gihaştim "Bêrîvanê"
Dayê… dayê… bûm gorî Kurdistanê
Dayê… dayê… ji ber soza civînê
Dayê… dayê… ji ber sonda bi xwînê
Dayê… dayê… em bûne nextê jînê
Dayê… dayê… bûn simbola evînê
Dayê… dayê… em in ê dilbirîn in
Dayê… dayê… xwe bi dora te digerînin
Dayê… dayê… azadiya te tînin
Dayê... dayê... neyar nedhate rayê
Dayê… dayê... kes li hana me nayê
Dayê... dayê… buhişta rû cîhanê
Dayê… dayê… sirûd a pîrê Xanê

Bêrîvanê

Nevya Zerdeşt û Xanê, bû hana berxwedanê
Heyvana serhildanê, pêşengê Bêrîvanê
Nexwest li malê rûnê daket cenga hebûnê
Mizgîna serxwebûnê, çelengê Bêrîvanê
Azadî hate bîrê şikand qulpên zincîrê
Çû bajarê Cizîrê, şepalê Bêrîvanê
Birûska ewrê tarî, xîj da cergê neyarî
Ji bîr nabe tu carî, hevalê Bêrîvanê
Nîşana navtêdanê, rewşa ceng û halanê
Bû bûka Kurdistanê, delalê Bêrîvanê
Rûkenê xemrevînê, l' bajarê Mem û Zînê
Xêlî ket nava xwînê, şemalê Bêrîvanê
Nevya Zerdeşt û Xanê, bû hana berxwedanê
Heyvana serhildanê, pêşengê Bêrîvanê



Hevdemê Seydayê Cegerxwîn û Seydayê Tîrîj e, yek ji helbestvanên herî kevin e li Cizîra Rojavayê Kurdistanê ku hetanî aniha li dinê ye û hêj helbesta klasîk dinivîse. Di sala 1932'yan de li gundê Gi'êd ê girêdayî bajarê Amûdê ji dêya xwe bûye. Di salên zaroktiyê de bi "êşa zirav" ket, ji lew re nikarîbû zû bi zû tevlî xwendinê bibe. Lê paşê li nik mele û seydayan feqetî kir. Di qonaxa feqetiyê de dest bi xwendina helbestên Melayê Cizîrê û Seydayê Cegerxwîn kir. Di sala 1957'an de yekem helbesta xwe bi navê "Yarê Ji Xew Rabe" nivîsiye. Di geşta nivîskariya xwe de du berhevokên helbestan berhem dane. Di helbesta H. Ferîdê Cizîrê de evîn, pesinê ciwaniyê, welatperwerî û aştîxwazî hêmanên sereke ne. Di sala 1959'an de li bajarê Hisiçayê bi cih bûye û hetanî aniha hêj li wê derê ye.

Bingeha Mikûm Yekîtiya Bi Xwînê ye

Bindestiyê, hiştin li paş
Doxa bivir, geh bûn maş
Gunehê giran, cenga bira
Rişma me dan dest tacira
Ên raperînê germ dikim
Axtiyê berhem dikin
Me ji hev dixin lîskê Neyar
Na ev nebû, haho hawar
Em hew dibin, goga şegan
Nabin kelaxê ber segan
Hinga yekîtî bê diyar
Amade ne xortên şiyar
Tiştê bûye rê jê dire
Em tev hebin a çêtir e
Yekîtî bila dengî keve
Agir bi canê wî kev
Rojên bihurtin çûn û çûn
Armanc e her dem serxwebûn
Zanîn bi çek hana me ye
Tim perçebûn jana me ye
Yekîtî bi xwînê çêdibe
Ew bingeha ser lê dibe
Aşê neyar, lê bûn qeraş
Dem çûn, bi vî hawî gelek
Kê em kirin nav agira?
Rê dan neyaran lek bi lek
Mehnan timî racem dikin
Dijimin re mane, gog û şeg
Pev ariyan çend car bi car
Giliyê me çû, çerxa felek
Nabin peyê, şêx û began
Qîl qîçe yê har î belek
Êrxên neyar zû têne xwar
Gorî welat in yek bi yek
Çend çûbe mayî bêhtir e
Pîwist e deryayê kelek
Carek dilê me di cî keve
Ê yekîtiyê nake gerek
Kurdo divê îro hebûn
Hana me ya hêzên biçek
Yekîtî riya mala me ye
Berpirsyar in jê serek
Merivantiyek nû çêdibe
Werinê li dor bibine xelek

Dibistan

Xunav û Rewşen, keçin rûliken
Şadî û Dilxweş, mîna gulên geş
Cendirme hatin, dijî welat in
Çavên wan dilîst, kanîn terorîst
Lewendê Pîrê, dahiştin bîrê
Camî dane xwar, mele kir hawar
Ji ber nemerda, me ol bi ber da
Bi zarê gemar, nola segê har
Raserî miriyan, dayîk digiriyan
Li hev rûnitşin, bavê me kuştin
Hana gundiyan, ma şêrê çiyan
Hildikin neyar, revî bare bar
Tevî Gulistan diçûn dibistan
Jîr in temîz in, pev re dilîzin
Bi kînek bilind, romî ketin gund
Kotek û lêdan, gundî girê dan
Meta Hesîna, dan ber pehîna
Ev in cinawir, serxoş û gawir
Ev ne mirov in, tev hirç û hov in
Sixêf digotin, kuştin û sotin
Zarok ditirsin, ji hev dipirsin
Em mane sêwî, koçbar û rêwî
Ên bi hers û kîn, şêrên dilbirîn
Vebûn dibistan, dijî Kurdistan

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683

bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Kultûrname

DILQÊ MEDRESEYA KURDÎ DI WÊJEYA KURDÎ DE - 7

Zeynulabidîn Zinar

Jixwe di Medreseya Kurdî de şaxekî xwendinê hebû ku jê re ”Edeba Behsê” ango uslûba axaftinê dihate gotin. Yanî piştî ku xwendina medreseyê kuta bibe, ev kes dê çewa bipeyive û awayê axaftinê ji bo her naverokekê çewa dê çêbibe, bi dersîtî dihate xwendin. Vê yekê jî tesîreke mezin li bipêşxistina zimanê kurdî dikir. Ev haweyê usluba axaftinê, gelek caran dersdarên medreseyê di rojên înan de li mizgevtê ji xelkê re jî digot ku divê axaftina mirov nerm be û peyvên sik û hişk neyêtin bikaranîn. Wek mînak:
Bavê min di zemanê xwe de dersdarekî xuyanî bûye. Di salên 1959-60’î de, min dîtiye ku heta 70-80 feqeyî jî li ba wî dixwend. Hin caran dema gundiyan şer dikir û ji hev zivêr dibûn, dijûnên pir xirab bi hevûdin dikirin. Bavê min roja înê wiha digote wan: ”Di şûna ku tu ji yekî re bibêjî -biborin- kurê kerê, bibêje kurê nemirovan. Hingê ew yek zêde zivêr nabe û dijûnê jî li te venagerîne. Di navbera we de ne şer çêdibe û ne jî xirabî…”
Dewlemendiyeke din a zimanê kurdî ku xwe bi desteka Medreseya Kurdî ragirtiye ev e ku mirov dikare naverokekê di axaftina bi zimanê kurdî de, bi du-sê awayên cuda bibêje û guhertin jî nekeve naverokê.
Ji vê yekê zêdetir, piraniya peyvên kurdî du, sê û zêdetir hevwateyên (sinonim) xwe hene. Wek mînak:
- Peyva ”sivnik”ê, di zimanê kurdî de 16 navên wê yên cuda hene, ew jî ev in: sivnik, gezik, gêsik, bermalk, kinoşe, havlêk, avlêk, sizîk, cerifk, simlik, mişkek, melkes, meknes, şijink, sirge, seqewêl, qarûşe.
- Peyva ”serhişk”ê, 14 navên xwe yên cuda hene. Wek mînak: serhişk, serreq, lasar, riko, rikoyî, rikdar, girik, mirik, cazgir, rûsirtik, sehend, mangir, birandoz, kelereq.
- Peyva ”milêb”ê, 10 navên xwe yên cuda hene. Wek mînak: sêgulî, milêb, milhêb, şene, dirgan, sêtilî, duguh, çitel, pêçok, neperûşk.
Fermo, de îcar ji xwe re lê temaşe bikin: Zimanê kurdî ku ev e li dora 90 salî hem qedexe ye hem jî hew qas di binê zext û cewrê de maye, ev dewlemendiya ku îro tê de tê dîtin, di zimanê kêm miletên xwedîdewlet ên dinyayê de heye.
Ev dewlemendiya zimanê kurdî di gel toreya kurdî ku xwe heta îro parastine, di radeya yekemîn de qerzdarê Medreseya Kurdî ne.

Berhemên Nû

Yekîtiya Nivîskarên Kurdistana Sûriyeyê 35 Pirtûk li Qamişloyê Îmze Kirin



Di 10’ê tîrmeha 2018’an de, Yekîtiya Nivîskarên Kurdistana Sûriyeyê li jêr diruşma “Gotina Çalak Nanê Azadiyê ye” pêşangeheke taybet bi pirtûkên ku wê çap kirine, li navenda xwe ya li bajarê Qamişloyê vekir. Di pêşangeha pirtûkan a Yekîtiyê de, 35 pirtûk ji weşanên Yekîtiyê hatin îmzekirin, “ji wan 75% bi zimanê kurdî ne, 25% bi zimanê erebî ne”, li gorî ku Cîgirê Serokatiya Yekîtiya Nivîskarên Kurdistana Sûriyeyê “Luqman Yûsiv” ji Bûyerpressê re da zanîn.
Yûvis got: “Ev duyemîn pêşangeha Yekîtiyê ye. Di pêşangeha yekemîn de 15 nivîskar tevlî bûbûn.”
Pirtûkên ku di vê pêşangehê de hatin îmzekirin: roman, çîrok, berhevokên gotaran, lêkolînên dîrokî û helbest in.
Çalakiyên pêşangeha Yekîtiyê roja sêşemê (10.07.2018) dest pê bûn û roja pêncşemê (12.07.2018) bi dawî bûn.
Hêja ye mirov bi bîr bixe ku pirtûkên di vê pêşangehê de hatin îmzekirin, ne tenê yên nivîskarên Cizîrê bûn, lê belê pirtûkên nivîskarên: Efrîn, Kobanê û Bakurê Kurdistanê jî hatin îmzekirin û weşandin.

Gotinên Pêşiyan

- Dewleta ku ba di bin de here, ne tu dewlet e.
- Her xwenda nabe mela.
- Ew çavê ku dijminê xwe nas neke, bila birije.
- Bibe xulamê zanan, nebe mîrê nezanan.
- Hezar pez xwe dide siya darekê.
- Hesp siwarê xwe nas dike.
- Dilê xweş her lê bihar e.
- Ji heramzadan helalzade nakevin.
- Padîşahê bêbext, ket ji text.
- Tu bar î ne heval î.

Xaçepirs

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1						■			
2			■		■				
3						■	■		
4							■		
5	■		■						■
6		■						■	
7							■		
8					■				
9				■					■

Sitûnî

1- Hêmin, bêdeng – Logo, sembol, lafîte.
2- Kesê li pêş, yê ku rê dinase, serwer – Lêkera “dotin” di dema borî de (yekjimar).
3- Dîn, ayîn – Navekî keçan e, tîpa pêşîne “L” ye.
4- Amûr an jî çeşmeya ku avê direşîne.
5- Zimanê welatiyên Îtalyayê.
6- Perestin bi erebî (nimêjên olî).
7- Dîn, ayîn – Pêdiviyeke bingehîn a jiyanê – Madeya ku ji êgir derdikeve.
8- Axaftin, salox, peyivîn – Bêhiş, bêaqil.
9- Tora mêşên hingivîn, nîşan (vajî) – Berga pirtûkê, xîlaf.

ASOYÎ

1- Ne buha, ne giran – Mezel, xurfe.
2- Şop, cade – Dengvedan.
3- Iqtîsadî – Hewa.
4- Bangdana di mizgevtê de û nimêja li pêş xelkê – Cihê ku genim lê tê hêran.
5- Diyarî, xelat.
6- Navekî keçan, berf û barana têkilhev.
7- Tîpên “Dîndar” belavkirî – Diwateya “sitand”.
8- Bajarekî parêzgeha Hemayê – Wêjevan bi erebî.
9- “Bav” bi tirkî û “hat” bi erebî – Dojeh, cehneme.

Sitêrname 16

Narîn Omer

Tabloya hunera kurdî, hunermend Şêrîna Mela di 1959’an de li bajarê Qamişloyê bi can û cendek bûye. Temenê wê sê sal bû dema ku malbata wê berê xwe dide biyaniyê û li Beyrûta paytexta Lubnanê bi cih dibe. Li wê derê, Şêrîn tevlî xwendinê dibe û xwendina xwe bi zimanên fransî û erebî dike. Di sala 1978’an de ji Lubnanê bar dike û berê xwe dide Ewrupayê. Li Almanyayê bi cih dibe û xwendina bilind di zanîngehê de bi dawî dike. Di sala 1983’yan de diçe Amerîkayê û li wir dimîne. Di heman salê de şû dike û paşê 3 zarokan tîne. Ji bilî zimanê kurdî, ew bi zimanên: erebî, almanî, fransî û ingilîzî diaxive.
Ji dengbêjî û sitranbêjiyê wêdetir, hunermend Şêrîn şêwekar e jî û hemî cureyên wêne û tabloyan çêdike. Der barê vê babetê de, H. Şêrîn di axaftineke xwe de wisa dibêje:
“Tevlî ku ez sitranbêj im û herî zêde berê xwe didim rengê niştimanî jî, lê belê şêwekarî hêmaneke girîng e di jiyana min de û kesayeta min a hunerî temam dike. Ji ber ku tişta ez di sitranê de nikaribim bidim der, ez bi rêya tabloyê derdibirim.”
Her wiha dibêje:
“Ez weku Şêrîn Perwer, nikarim cudahiyê bikim di navbera deng û regê gerdûna ku ez tê de dijîm”.
Hunermenda me tekez dike ku ew ji malbateke welatperwer û dilsoz e û dibêje ku malbata wê bi xwe ji Cizîra Botan e, lê ji ber zordestiya rêjîma Tirkiyê reviyaye û li Qamişloyê bi cih bûye.
Li ser destpêka jiyana xwe ya hunerî, H. Şêrîn dibêje:
“Ji ber ku bavê min dostê Partî Dîmoqratî Kurdistanî\Iraq bû, ji zaroktî ve min xwe di kom û komeleyên hunerî, çandî û konevanî de dîtiye...”
Şêrîn tekez dike ku yekemîn kesa ku di warê hunerê de bandor lê kiriye dayîka wê ye. Dibêje ku dengê wê pir xweş bû, lê ewê sitran nedigotin, ji ber ku ew ji malbateke oldar bû, her wiha ji tirsa rewiştên civakî û binemalî jî nedikarî. Ew dibîne ku bandora Radyoya Kurdistanê û dengbêjên wekî: Hingo, Miradê Kinê, Xidirê Emer… li wê bûye. Ji aliyê xwe ve hunermend Se’îdê Yûsiv tekez dike ku bandora wî li ser hunera Şêrîn a herî mezin û girîng e û ewî dergehên navdariyê li pêşê vekirine, ji lew re dibêje:
“Min hunermend Şêrîn derbasî hola hunerê kiriye. Min ew fêrî zimanê kurdî kiriye û rê û şopên rast û dirust li pêş roniî kirine. Min li Beyrûtê ew tevlî koma xwe ya muzîkê jî kiriye...” Lê Şêrên tekez dike ku fêrbûna wê ji zimanê kurdî re yek ji encamên welatperwerî û dilsoziya malbata wê ye û bi saya mamosteyên wê Kamîranê Bedirxan û Zeya Şerefxan e.
Şêrîn dibêje ku yekem car ew di sala 1972’yan de li ser dika şanoyê rawestiyaye, ew jî dema ku malbata wê û çend malbatên

Şêrîn Mela… Tabloya Hunera Kurdî

kurd ên welatperwer ahengeke Cejna Newrozê li Beyrûtê li dar xistiye.
Di navbera salên 1976 û 1977’an de, wê li paytexta Urdinê “Uman” di Koma Selahedînê Eyûbî ya hunerî de kar kiriye.
Heta aniha ewê şeş kaset belav kirine û hin ji wan kasetan bi hunermend Şivan Perwer û hunermend Se’îd Yûsiv re ne.
Piştî ger û geşteke dirêj û mifadar, hunermenda me vedigere Kurdistana Başûr û li wir bi cih dibe.
Hunermend Şêrîn xwe dibîne sitranbêja sitranên niştimanî û welatperwerî. Dibîne ku dûrbûna wê ji welat û civakê, ji dost û mirovan, ji wargehên zaroktiyê ew ber bi huner û sitranbêjiyê ve ajotiye. Tevlî hezkirina wê û malbata wê ya bêdawî ji walat û civakê re, biyaniyê jî hezkirina welat û xakê di dil û giyanê wê de geştir kiriye, her wiha doza miletê wê her dem li bîra wê hêlaye. Silav û qevdên sipasiyan ji hunermend Şêrîn Mela re.

Peyva Windayî **Da ku tu peyva windayî bibînî, peyvên jêrîn xêz bike:**

NÊRGIZ – AV – DÊMANÎ – KOZIK –BÊJING– TÛTIN –KORDISTANA SOR – GUNDÎ – PÊJGEH – FÊRGEH – ŞÊWIRMEND – HÊSTIR – XWEPARASTIN – MÊRDÎN – DÎLOK – BIJÎŞK – ROBAR – SAZBEND.

Peyva windayî ji 6 tîpan pêk tê, ew jî navê wî kesî ye yê ku ji welatê xwe bi dûr ketiye.

G	U	N	D	Î	E	B	Ê	J	I	N	G
K	U	D	I	S	T	A	N	A	S	O	R
T	Û	T	I	N	N	Ê	R	G	I	Z	O
S	A	Z	B	E	N	D	K	O	Z	I	K
R	Ş	Ê	W	I	R	M	E	N	D	A	V
X	W	E	P	A	R	A	S	T	I	N	K
D	Î	L	O	K	B	M	Ê	R	D	Î	N
P	Ê	J	G	E	H	B	I	J	Î	Ş	K
H	Ê	S	T	I	R	Ç	R	O	B	A	R
D	Ê	M	A	N	Î	F	Ê	R	G	E	H

Bersiva Xaçepirsa Hejmara Çûyî

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1	B	E	Y	R	Û	T	■	E	Z
2	A	■	E	E	■	E	M	■	A
3	T	A	T	W	A	N	■	O	X
4	M	■	Q	A	M	I	Ş	L	O
5	A	M	A	N	■	K	Î	■	■
6	N	A	N	■	Ê	■	R	M	A
7	■	N	■	M	A	K	■	E	R
8	E	■	N	A	N	■	W	■	A
9	M	A	N	■	Z	A	W	Ê	S